Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 995 | 11-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# Tuwala Li Çiyayan: Girên Keskesor

re xwedî dîmenek ecêbek a xwezayî ye. Qada Aladagh ya li vir bi qasî 70 kîlometre çargoşe ye. Herêm wekî Parka Jeolojîk a Neteweyî ya Aladaghlar tê binavkirin.

### Her Demsala Wê Cuda Bedew E

Aladaghlar li Mahenshanê yek ji cihên herî xweş ya seyranê ye. Ev çiyayên ku ji Mahneşan heya Mîdane an jî li ser rêya Zencan-Tebrizê dirêj dibin,



dîmeneke ku berdelê mirov lê temaşe bike derdixe holê. Aladaghs hema her demsal çavderiya cimbişek cûda ya rengan dide. Dema ku tîrêja rojê bi hemû tûjbûna xwe lê dide rengên zindî derdikevin holê, payîz û zivistan an jî di hewaya baran û berfê de jî dîmenek cûda bi dest dixe.

### Mekana Gûzergeha Wênekêşan E

Tê zanîn ku di nava Mahneshanliyan û gelên herêmê dijîn de, kevneşopiyeke kevnar a demek dirêje didome heye ku bi taybetî di destpêka sersalê de ji bo xemilandina xaniyên xwe van gilên rengîn bikar tînin. Herêm her dem di nava mekanên gûzergeha wênekêşan de cih digre. -JÎNHA

Çiyayên Keskesor yên li çend deverên cîhanê cih digirin, şopa mîlyonan salan hildigirin, bi dîmenên xwe yên rengûreng temaşevanan mest dike. Navenda Nûçeyan - Çiyayên ku ji ber rengên xwe wek Çiyayên Keskesor tê binavkirin, li çend deverên cîhanê cih digirin. Dema zinarên sor, porteqalî, kesk, zer û binefşî kesên ku dibîne ji xwe re heyran dihelê, tê zanîn ku ev zinar di encama qûm û mîneralên din ên ku ji ber tevgerên tektonîk ên 24 mîlyon sal berê pêk hatine derketine holê.

### Reng Çawa Çêdibin?

Hesinê ku avahiya madenên zinaran pêk tînin, dibe sedem ku çiya bi rengên cuda xuya bikin. Di encama reaksiyonên kîmyewî de, text dîtina rengê sor, sorikî an jî qehweyî qezenc dike. Mînak mînerala lîmonît ji qehweyîya tarî heta zera vekirî dibe sedema çêbûna rengan. Di encama reaksiyona hesin a bi îyonên silikat re mîneralên klorît û olivînê jî dibe sedema çêbûna tonên kesk.

### Welatên Xwedî Çiyayên Keskesor

Li paytextê Tirkiyeyê Enqere Nallıhanê jî dîtina textên bi rengên cuda mijara gotiyê. Perû, Çîn û Îran jî welatên ku xwedî çiyayên bidîmena Keskesor in. Herêma Mahneşan a Îranê ji aliyê mîneralan ve yek ji herêmên herî dewlemend ên welat e. Mahneşan bi reaksiyona sifir, hesin, çinko û elementên mîneral yên din

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

**Eger xeyalê te hebe ti bibe lîstikvanê Şano yan jî Sînamyê, serdana Kargeha Şano li bajarê Qamişlo bike û xeyalên xwe pêk bîne.( Di heftiyê de her roja Înê tomarkirin heye)**




### Sudoku: Pirs 5

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | | | 9 | | | | | 5 |
| | | | | | | 4 | | 2 |
| | | 3 | 6 | 7 | | 1 | | |
| | 8 | 7 | | 2 | | 3 | 9 | |
| | | | 5 | | 4 | | | |
| | 3 | 4 | | 9 | | 5 | 2 | |
| | | 2 | | 1 | 9 | 7 | | |
| 3 | | 5 | | | | | | |
| 1 | | | | | 5 | | | 6 |

### Sudoku: Bersiv 4

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 9 | 4 | 7 | 8 | 1 | 5 | 6 | 2 |
| 2 | 5 | 8 | 3 | 6 | 4 | 9 | 7 | 1 |
| 7 | 1 | 6 | 2 | 9 | 5 | 8 | 4 | 3 |
| 4 | 3 | 7 | 8 | 5 | 6 | 1 | 2 | 9 |
| 9 | 6 | 5 | 1 | 2 | 7 | 3 | 8 | 4 |
| 8 | 2 | 1 | 4 | 3 | 9 | 7 | 5 | 6 |
| 6 | 8 | 2 | 9 | 7 | 3 | 4 | 1 | 5 |
| 1 | 7 | 3 | 5 | 4 | 2 | 6 | 9 | 8 |
| 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Z | Î | N | ■ | | ■ | Q | E | R |
| 2 | E | ■ | A | X | ■ | K | E | Y | A |
| 3 | B | A | B | E | K | ■ | R | ■ | Z |
| 4 | A | J | O | ■ | A | D | A | R | ■ |
| 5 | N | ■ | S | O | L | ■ | Ş | O | Ş |
| 6 | Î | D | ■ | D | E | H | ■ | M | Û |
| 7 | ■ | A | D | E | M | ■ | N | A | ■ |
| 8 | A | S | A | ■ | Ê | D | Î | ■ | Î |
| 9 | ■ | Î | D | I | R | ■ | V | Î | N |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | |
| 2 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 3 | | | | | | | ■ | | |
| 4 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 5 | | | ■ | | | | | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 7 | ■ | | ■ | | | | | ■ | |
| 8 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 9 | | ■ | | | | | ■ | | |

**ÇEP-RAST**

1. Ji pêncan yek zêde... Mehek
2. Bi erebî "ez"... Vexwarina sereke
3. Oda keştiyan... Ji wî/ji wê
4. Pirsek di rewşa ne tewandî de... Fen û fût, hîle
5. Xanedana qraliyeta Vîetnamê... Esîlza, zadegan
6. Kurteya ajansa nûçeyan a Firatê... Cihê ku çûk û teyr xwe lê datînin
7. (Siyabend …) Destaneke me
8. Kesê ku mala wî nêzîkî yekî din e... Yezdanekî misrî
9. (Derwêşê …) Destaneke me... Qertafeke neyînî

**JOR-JÊR**

1. Beranê 1-2 salî... Notayek... Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin
2. Niştecihê sabît
3. Rojek... Notayek
4. Peyva neyînî... Ji bo xwarina nepijiyayî an jî nîvexavî
5. Govendkêşê ku dîlanê digerîne
6. Tevgera hewayê... Cesûr, wêrek, dilawêr
7. Melevanî, soberî... Cureyekî xwînê
8. Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Kurtebêja Antîmonê

# 'Bi berxwedan û têkoşîna gel wê têkbirina tecrîdê misoger bibe'

Welatiyên kantona Efrînê tecrîda li ser Rêber Apo şermezar kirin û diyar kirin ku armanca tecrîdê tinekirina gelê Kurd û têkbirina hêza jinê ye. Herwiha dan zanîn ku bi xurtkirina têkoşînê wê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bibe. ***R-5***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 995 | 11-Îlon- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# KONFERANSA 3'YEMÎN YA JÎNÊN CÎHANÊ: EM HÊZA XWE JI JINÊN KURD DIGIRIN

Buşra Elî ku beşdarî Konferansa 3'yemîn ya Jinan ya Cîhanî bû ye, da zanîn ku di konferansê de hat teqez kirin ku tekoşîna azadiyê ya jinên Kurd ji bo jinên cîhanê bûye çavkaniya tekoşinekê hevpar ya jinan. ***R-2***




## Li Efrînê nasnameya kurdan ji hole tê rakirin

Têkildarê avakirina mêtingeriyê li kantona Efrînê, Erîfa Bekir diyar kir ku dewleta tirk û rêxistinên alîgirê wê yên di Efrînê de, bi avakirina mêtengeriyê dixwezin nasnameya gelê Kurd ji hole rakirin. ***R-4***



## 'Rêveberiya Xweser kilîta çareseriya aloziya Sûriyê ye'

Besam Seqir: Aloziya Sûriyê bi riya diyaloga Sûrî–Sûrî tenê çareser dibe û kilîta çareseriyê jî li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Lewra gelên herêmê tevan himbêz dike. ***R-5***



## Navenda "Ehlen Simsim" ji bo pêşketina danûstendina zarok û malbata ye




Bi armanca avakirina kesayetek baş û dirust ji aliyê danûstandinê ve, Desteya Jinan ya Herêma Cizîrê û rêxistineke navneteweyî navendeke pêşveçûna zarokan ya bi navê 'Ehlen Simsim' vekirin. ***R-2***

## Neşopandina firoşkara û bihayê zêde



Neşopandina firoşkaran û bilindbûna dolar dibe sedemê cudahiya di navbera buhayê pêdiviyan. ***R-6***

## Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê: Berxwedana li Zap û Metîna berxwdaneke netewyî ye

Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê diyar kirin ku divê êrişa li ser gerîla ya li Xelîfanê bê ronîkirin. Herwiha bang li gelên Kurdistanê kirin ku li dijî dagîrkeriya tirkî berxwedanê bilin bikin. ***R-3***

**Darbeya Leşkerî ya 12'ê Îlonê**
Farûk SAKIK — ***R-4***

**Berxwedanê Heqîqeta Faşîzma Tirk Rût Kiriye**
Idrîs HENAN — ***R-5***

**Pirsgirêkên Kurdên Misilman**
Ahmed Aktaş — ***R-6***

# Konferansa 3'yemîn ya jinên cîhanê: Em hêza xwe ji jinên Kurd digirin

**Buşra Elî ku beşdarî Konferansa 3'yemîn ya Jinan ya Cîhanî bû ye, da zanîn ku di konferansê de hat teqez kirin ku tekoşîna azadiyê ya jinên Kurd ji bo jinên cîhanê bûye çavkaniya tekoşînekê hevpar ya jinan.**

**Rojbîn Zagros/Tûnis**



3'yemîn Konferansa Jinan a Cîhanî ku ji nêzî 30 welatan delegeyên jin beşdar bûn, 4'ê îlonê li Tûnisê bi meşekê dest pê kir. Jinan bi reng û alên xwe yên neteweyî cihê xwe di meşê de girtin. Hemû jinan bi yek dengî bi her zimanî dirûşm berz kirin. Konferansa ku 4'ê îlonê dest pê kir, 10'ê Îlonê bidawî bû. Konferans her 5 salan li parzemîneke tê lidarxistin. Di konferansa 3'yemîn ya li Tûnisê



nêzî 450 jinên ji dewletên cûda beşdar bûn. Herwiha gelek çalakî û nîqaşên derbarê rewşa jinan de hatin kirin. Nîqaşên girîng li ser çareseriya pirsgirêk û tekoşîna azadiya jinan û zehmetiyên ku jin li çar aliyê cîhanê jiyan dikin, pêş ketin.

Derbarê giringiya lidarxistina konferansê û rola jinan, jinên ku beşdarî konferansê bûne diyar kirin ku, wê têkoşîna xwe ya li dijî zilm û zordariyê gav bi gav bi pêş bixin û nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

### `Emê dengê xwe bikin yek û hêzê bidin hev`

Seroka Komeleya Jin Buşra Elî ku tevlî konferansê bûyî, da zanîn ku lidarxistina vê Konferansê di dema niha de pir girêng û pêwîst bû û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Ev konferans ji bo jinan xebatekî pir girêng e. Lewra tê de nîqaşên derbarê salê derbasbûyî û salên pêş de hatin kirin. Herwiha biryaên nû ji bo xurtkirina têkoşîna jinan û têkbirina tundî û hişmendiya desthilad ya zilam, hatin dayîn. Herwiha hat armanckirin ku bi rêya vê konferansê dengê jinan bibe yek û bidin nîşandan ku hêza jinên cîhanê wê bihev re wê xurttir be."

### `Nîqaşên girîng û berfireh li ser rewşa jinan hatin kirin`

Buşra Elî behsa nîqaşên ku li Konferansê hatin kirin kir û wiha got: "Gelek nîqaşên berfireh û mijarên cuda li konferansê hatin kirin. Nîqaş li ser rewşa jinan li her çar aliyên cîhanê hat kirin; li ser atoleyên jinan, herwiha nîqaşên berfireh li ser rewşa tundiya li ser jinan li her dewletê; rewşa jinên Êzîdî û Efxanistanê, rewşa jinên rojavayê Kurdistanê, rewşa dagîrkeriya Israîlê li ser gelê Filestînê, êş û zehmetiyên ku jin dikşînin; rew-




şa jinên kedkar, rewşa jinên Êzîdî yên ku heta niha çarenûsa wan ne diyare, hewldanên rizgarkirina jinên ku di destê DAIŞ`ê de, hatin kirin. Bi giştî nîqaş li ser rewşa jinan hate kirin. Heriwha jinên ku beşadarî konferansê bûne jî behsa rewşa jinên li welatê xwe kirin. Bi vî awayî rewşa tevayiya jinan ya li tevayiya welatan hat diyarkirin."

### 'Jina Kurd bingeha hêvî û paşeroja me ye'

Bûşra Elî bal kişand ser rola jinên Kurd di Konferansê de û axaftina xwe wiha qedand: "Jinên Kurd ji roja destpêkê ve reng û cûdahiya xwe dan nîşadan. Hem di çalakiyên li Konferansê de, hem jî di nava nîqaşan de roleke pir girîng lîstin. Herwiha gelek jinên li konferansê jî bal kişandin ser têkoşîn û federkariya jinên Kurd û dan zanên ku ew hêza xwe ji jinên kurd digrin, Herwiha gotin, jina Kurd bingeha hêvî û paşeroja me ye."

### 'Ji 40 welatan jin tevlî konferansê bûn'

Endama Komîteya Têkîlî û Lihevkirinên Demokratîk ya Kongireya Star Menal Mihemed jî, da xuyakirin ku tevlîbûna jinan ji 40 welatan hêzeke mezin di nava jinên konferansê de da avakirin û wiha pê da çû: "Tevlîbûna jinan ya îsal ji salên berê baştir bû.



Herwiha vê tevlîbûna xurt hişt ku têkiliyên jinan li tevayiya Cîhanê xurttir bibin. Ji bo wê jî ya balkêş di konferansê de ew bû ku jinan ji gelek welatên cûda cihê xwe di nava vê konferansê de girtin û rola xwe baş lîstin."

Menal bal kişand ser cûdahiya Konferansa 3'yemîn û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Konferansa îsal ji konferansên berê cûdatir e. Lewra tevlîbûna jinan zêdetir bû. Nîqaş û biryarên pir girîng hatin kirin û ev yek wê di demên pêş de encamên baş bide."

### `Yekbûna jinan wê têkoşîna azadiyê bi ser bixe`

Endama Komîteya Têkîlî û Lihevkirinên Demokratîk ya Kongireya Star Menal Mihemed di dawiyê de got, wê ev konferans hêza jinan li tevayiya Cîhanê xurttir bike û wê bibe bersiva êrişên li ser jinan. Herwiha bi hevkarî û yekbûyîna tevayiya jinan, emê bigihin serkeftina tekoşîna azadiya jinê.

# Navenda "Ehlen Simsim" ji bo pêşketina danûstendina zarok û malbat a

**Bêrîtan Çiya-Qamişlo**

**Bi armanca avakirina kesayetek baş û dirust ji aliyê danûstandinê ve, Desteya Jinan ya Herêma Cizîrê û rêxistineke navneteweyî navendeke pêşveçûna zarokan ya bi navê 'Ehlen Simsim' vekirin.**

Li bajarê Qamişlo li taxa Qudûr Beg, ji bo dûrxistina zarokan ji rewşa şer, herwiha ji bo pêşketina wan ji aliyê danûstandinê ve, navenda bi navê 'Ehlen Simsim' hat vekirin. Navenda "Ehlen Simsim" ji du beşan pêk tê, beşek jê hevalên "Ehlen Simsim" in ku ew zarokên 3 heta 8 salî pêşwazî dike, beşa din jî ji bo malbatên ku dixwazin rewşa zarokên xwe bişopînin û fêrî perwerdekirna danûstandina bi zarokên re ye. Navend heta navê 20 zarokan tomar dike.

### `Armanc pêşxistina mêjiyê zarokan e`

Têkildarê mijarê mamosteya navendê, Xezal Iniz wiha axivî: "Armanca me ji vekirina vê navendê ew e ku, em ziman û mêjiyê zarokan ji aliyê fêrkirina rêbazên danûstandina bi zarokên din re pêş bixin."

Xezal Iniz diyar kir ku ev navenda ku li taxa Qidûr Beg ya bajarê Qamişlo hatiye vekirin, dê di perwerdekirina malbatên zarokan de jî rolekê bilîze. Xezal wiha got; "Wê malbatên zarokan jî li ser rêbazên danûstandina bi zarokên xwe re, ji aliyê mamosteyên pispor ve û mezinkirina wan bi awayekî rast werin perwerdekirin."

Herî dawî mamoste Xezal Iniz da zanîn ku zarokên pêdiviyên taybet




jî dikarin tevlî perwedeyê bibin. Herwiha da xuyakirin ku wan du navendên din jî vekirine, yek li taxa Aşûriyê ya Qamişlo, ya din jî li navçeya Tirbespiyê ye.

### Girîngiya navendê ji bo pêşketina zarokan

Li ser heman mijarê jina bi navê Hiyam Ebdulcelîl jî ku wê zarokek xwe tevlî navendê bike, ji me re axivî û got, navendên bi vî rengî pir girîn û pêwîst in, bi taybetî di rewşên şer de.

Hiyam axaftina xwe wiha domand: "Rewşên şer pir zerarê digihîne derûniya zarokan, lewra stran,



film, pêşengeh her tişt behsa şer dike. Herwiha di nava malbatê bi xwe jî, her tim behsa şer tê kirin. lewra vekirina vê navendên ji bo zarokên me pir başe."

Hiyam Ebdulcelîl di dawiyê de spasiya Desteya Jinan ya Herêma Cizîrê kir û got, hêviya me ewe ku zarok û malbat ji perwerdekirina pêşketina danûstandinê, sûdê bigirin.



# Ji Zarokan re Kurdî hêsan dikin

**Saziya Perwerdeya Civaka Demokratîk a Êzîdxanê (SPCDÊ) ji bo sala nû ya xwendinê dewreyeke perwerdeyê ji bo mamosteyan da destpêkirin. Berdevkê saziyê Nayîf Şengalî diyar kir ku ew ji bo sala nû ya xwendinê amade ne û dixwazin li her derê gel vegeriyaye, dibistanan vekin.**

Ji bo sala nû ya xwendinê SPCDÊ ji bo mamosteyan xwe hemûyan dewreyeke perwerdeyê daye destpêkirin. Hem li navenda Şengalê û hem jî li bajarokê Xanesorê jî perwerde dewam dike. Di nava 15 rojan de perwerde wê bi dawî bibe û êdî amadekariyên dawî ji bo despêkirina sala nû ya xwendinê dê bên kirin.

Derbarê dewreya perwerdeyê de mamoste Hazim Xelîl got, "Em



hersal ji bo mamoste bi awayekî hîn baştir nêzî şagirtên xwe bibin, kêmahiyên berê çareser bikin, giraniyê didin perwerdeyê. Em dixwazin sîstema me a ziman dayîkê, zêdetir li Şengalê berfireh bikin. Ji ber ku bi vî zimanî em dikarin çanda xwe biparêzin û li dîroka xwe serwext bibin." Xelîl Bang li malbatan hemûyan kir da ku zarokên xwe bişînin dibistanê û got; "Armanca me ew e ku em çanda xwe ya kevnar û dîroka xwe bi zarokên civaka xwe bidin naskirin."

Berdevkê SPCDÊ´yê Nayif Şengalî jî got, "Ji bo çareserkirina pirsgirêkan me ev perwerde da destpêkirin. Em dixwazin di dersên ji zarokan re giran de hin guhertinan çêkin. Em dixwazin îsal li her cihê ku gel vegeriyaye, dibistanan vekin û zarokan bi zimanê wan ê dayîkê perwerde bikin."

***ROJNEWS / ŞENGAL***

# Xerîdarên Kurdî Zêde Dibin

**Dîlan Guvenç dibêje, hîna daxwaza perwerdehiya bi zimanê dayikê nehatibe qebûlkirin jî ji 2000'î ve ev daxwaz zêde bûye, hejmara kurs û kursiyeran jî zêde bûye.**

MED-DER'ê rapora ku ji hêla Navenda Lêkolînên a Sosyopolîtîk ve hatiye amadekirin di civîna çapemeniyê de parve kir û bal bire ser daxwaza perwerdeya bi zimanê dayikê.

Navenda Lêkolînên Sosyopolîtîk, derbarê kursên ziman ên Komeleya Lêkolînên Çand û Zimanên Mezopotamyayê (MED-DER) de raporek amade kir. MED-DER'ê ev




rapor bi civîna çapemeniyê li raya giştî eşkere kir. Civîna çapemeniyê li avahiya MED-DER'ê pêk hat û pankarta "Perwerdeya bi zimanê dayikê mafekî bingehîn û gerdûnî ye. Binpêkirina vî mafî sûcê li dijî mirovahiyê ye" hat daliqandin. Hevserokê MED-DER´ê Rifat Ronî û mamosteyên komeleyê tevlî daxuyaniyê bûn.

Rapor ji aliyê rêveberên MED-DER'ê Dîlan Guvenç û Nesîp Gultekîn ve bi Kurmancî û Kirmanckî hat xwendin.

### Daxwaza perwerdeya Kurdî xurt bû

Dîlan Guvençê got, li Tirkiyeyê daxwazên perwerdehiya zimanê dayikê demeke dirêj e di rojevê de ye, bi salan ji hêla rêxistinên sivîl ve kursên zimanê dayikê hatine: "Di navbera salên 2012 û 2013'yan de hewldanên parastin û hînkirina zimanê dayikê gaveke bi pêş ve çû. Di dibistanên navîn de hefteyê du seatan bi navê 'zarava û zimanên zindî' ket rojeva Wezareta Perwerdehiyê. Hîna daxwaza perwerdehiya zimanê dayikê nehatibe qebûlkirin jî ji 2000'î heta niha di daxwazên perwerdehiyê de zêdebûnek heye. Bi vê yekê re hejmara kurs û kursiyeran jî zêde bûye. Tê ditîn ku bi taybetî di dema pandemiyê û piştî pandemiyê de daxwaza kursên Kurmancî û zaravayên din zêde bûye."

### Rapor hat amadekirin

Dîlan Guvençê got, li ser vê babetê, navenda Lêkolînên Sosyopolîtîk ji bo zanibe daxwaz, sedem û nasnameya kursiyerên ku dixwazin hînî Kurmancî û zaravayên din bibin çi ne, xebateke lêkolînê kiriye: "Lêkolîn di dema destpêka vegirtina COVID-19'ê de di navbera salên 2020 û 2022'yan de hat kirin daneyên MED-DER´ê esas hatin girtin. Dane li ser kursiyerên ji tevahiya Tirkiyeyê û ji derveyî sînorên Tirkiyeyê ne. Daneyên hatin venêrin, ewil derbasî SPSS´yê hatin kirin. Piştre daneyên ku li gorî tablo û grafîkan hatin analîzkirin bi analîzên cins, sal û zaravayên beşdaran li ber jev hatin girtin."

***JINNEWS***

# Fîlma "Koçberî" Li Kobanê Hat Pêşandan

**Ronahî TV fîlma "Koçberî" li hola Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido pêşand. Bi sedan şêniyên kantona Kobanê li fîlmê temaşe kir.**

Li hola Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido ya li Kobanê, fîlma Koçberî hat pêşandan. Gelek şênî beşdarî fîlmê bûn.

Çîroka fîlmê girêdayî şerê taybet a ku dewleta Tirk a dagirker li dijî şêniyên herêmê dimeşîne da ku koçber bibin û herêm vala bibe. Her wiha film balê dikişîne ser xetereyên koçberiya nerewa û karesatên di encamê de bi civa-



kan pêk tên.

Beriya pêşandana fîlmê, rojnamevan û endama Komîteya Amadekar a fîlmê Dîcle Ehmed axivî û diyar kir ku koçberiya ciwanan, yek ji xetereyên herî mezin li ser civakan e bi taybet li Rojava ku şoreşeke dîrokê lê li dar e. Her wiha teqezî pê kir ku divê civak planên dagirkeriya Tirk têk bibe û niyetên wê yên dijminane eşkere bike.

Piştî pêşandana fîlmê, endamê Rêveberiya Meclisa Yekitiya Ragihandina Azad a Herêma Cizîrê Şivan Mesê bi navê yekitiyê, nivîskarê senaryoya fîlmê rojnamevan Nîhad Karo, kameravanê filmê Ehmed Şikrî, montajê fîlmê Mihemed Mistefa, listîvanê sereke yê fîlmê Ehmed Maşîd, awazvan û hunermend strana filmê Hisên Xanî xelat kir.


Ronahî TV film berhem kiriye. Tê de bi dehan lîstivanên ciwan ji Kobanê hene. Gelek saziyan rolek di berhemkirina fîlmê de lîstiye.

***ANHA***

# Hunerê Li Peravên Behrê

**Malbata Leva Slares bi projeya xwe ya ku navê wê kirine "Beach4Art" tê zanîn.**

Malbata Leva Slares bi projeya xwe ya ku navê wê kirine "Beach4Art" tê zanîn. Min got, malbat



ji lewre Leva Slares tevî hevjînê xwe Dzintars û 2 zarokên xwe vê projeyê bi rê ve dibe. Ew dema diçin ber peravên behrê, tenê bêhna xwe venadin û dema xwe betal derbas nakin.

Ew weke malbat li peravên behrê bi huner re mijûl in û ji kevir, dar û dircên derûdora behrê peykerên xweşik çêdikin. Her wiha fêkiyên ku hatine avêtin û kulîlkên hişk bûne jî weke malzeme bi kar tînin. Piştî ku van peykeran çêdikin, wêneyên wan jî digirin û li ser hesabê xwe yê Instagramê parve dikin.

Malbata Leva Slares piştî şewba korona û pandemiyê li vî hunerî germ bûye. Ev yek weke fersendekê bi kar aniye.

Destpêkê dawiya heftê weke hobî ev kar kirine, lê bi demê re ev bûye karê wan ê daîmî û êdî bi rêk û pêk vî karî didomînin. Wan heta niha bi malzemeyên ku hatine avêtin, li Peravên Bakûrê Devon ên li Inglistanê, gelek wêneyên xweşik ên rengo rengo çêkirine. Wêneyên masî, perperîk û bûmê çendek ji van wêneyên wan ên xweşik in.

***Ozgurpolîtîka***

# Neşopandina firoşkara û bihayê zêde

## Neşopandina firoşkaran û bilindbûna dolar dibe sedemê cudahiya di navbera buhayê pêdiviyan.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Derbarê cûdabûna navbera nirxên pêdiviyan û bihabûna bêserûber de, welatiyên bajarê Qamişlo û rêveberê beşa pêşjiyanî ya bajarê Qamişlo ji me re axivîn.

**`Her yek li gor keyfa xwe kelûpelên xwe bi bihahî difiroşe`**

Welatiya bi navê Safiya Elî da zanîn ku dema ew pêdiviyan ji bo mala xwe dikire, êdî nizane ji gel kîjan firoşgehekî bikire, ji ber ku di navbera her firoşkarekî de nirxên pêdiviyan cûda dibin û axaftina xwe wiha domand: "Mijar bûye mijara keyfê. Her firoşkarek li gor keyfa xwe bihayekî ji



xwe re hildibjêre. Niha jî li hin dikanan kîloyê şekir bi 3 hezar û 500 lîreyan tê firotin, heman demê li dikana kêleka wan bi 4 hezeran difiroşin. Xuyaye kesên wisa dikin wicdanê wan naêşe."

**`Ne bese bihabûn, bi ser de cûdahiya nirxan jî heye`**

Safiya bîr xist ku gelek malbat hene xizanin û rewşa wan ya aborî zehmete û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber vê bihabûna bêserûber gelek malbat nikarin pêdiviyên mala xwe peyda bikin. Ne bese bihabûn, bi ser de jî cûdahiya nirxan heye."



**'Komîteya Şopandinê di karê xwe de lewaz e`**

Safiya Elî di dawiyê de got, Ji bo ku şopandinek sererast ji vê rewşê re hebe, divê komîteya şopandinê hê zêdetir rewşê bişopîne û kesên ku vî karî dikin caza bike. Wê demê dibe ku ev tevlîheviya bihayan zelal bibe.

**`Cûdahiya nirxan pirsgirêka herî mezin e`**

Welatiyê bi navê Ehmed Silêman jî diyar kir ku xwediyên dikanan bi hiceta bilindbûna dolar bihayê kelûpelan zêde dikin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Pirsgirêk ne di bihabûnê tenê de ye, ya ku mirov matmayî dihêle ewe ku cûdabûna nirxan di navbera du dikanaên nêzî hev jî pir heye. Ev pirsgirêke her ku diçe mezintir dibe û divê bi lez li ser bê sekinandin."

Ehmed got, her çiqas jî rêveberiya pêşjiyanî bihaya sebze û fêkî destnîşan kiribe jî, firoşkar wan nirxan esas nagirin û ev yek jî nayê şopandin.

Ehmed Silêman di dawiyê de bang li saziyên pêwendîdar û rêveberiya pêşjiyanê kir ku vê pirsgirêkê çareser bikin. Da ku welatî karibin pêdiviyên xwe bi nirxên baş û weke hev pêyda bikin.

**Giropên şopandinê rojane li nava bajêr digerin**

Rêveberê beşa pêşjiyanî ya bajarê Qamişlo Silêman Ednan da zanîn ku girupên wan yên şopandinê, rojana li nava bajêr digerin û rewşê kontrol dikin û axaftina xwe wiha domand: "Pênc girûpên me yên ji bo şopandinê hene. Jimara endamên me yên şopandinê 19 ne. Ev endam rojê nêzî 6-7 caran derdikevin şopandinê. Biawayekî sîstematîk Sibehan û êvaran şopandin tê kirin. Di şopandinê de tevayiya dikanên li bazarê û yên nava taxan, herwiha firûn û sûka tên şopandin."

**`Firoşkar li gorî lîsteyê tev nagerin`**

Silêman got, ofîsa rêveberiya giştî ya pêşjiyanî her du rojan carek, lîsteyek



derbarê bihayê pêdiviyan li ser malper yan jî fesbooka xwe belav dike. Da ku firoşkar jî li gorî vê lîsteyê tev bigerin. Lê mixabin hin firoşkar guh nadin vê lîsteyê û li gorî keyfa xwe bihayan di



hildibjêrin. Di mehê de bi giştî nêzî 170 mûxalefe çêdibin. Her mûxalefe jî li gorî madeyê tê kirin.

Silêman derbarê madeyên ku dema wan bi dawî bûne û hê jî li dikanan tên firotin wiha got: "Di şopandinê de eger madeyên ku dema wan bi dawî bûne bên dîtin, ev made ji firoşkaran tê standin û ji firoşkar jî hesaba vê tê xwastin."

Silêman Ednan Silêman di dawiyê de bang li welatiyan kir ku gilî û gazinên xwe li ser firoşkarên ku madeyan bi buhayeke cûda difroşin bikin û agahiyan bidin me. Herwiha got, wek rêveberiya Pêşjiyanî em rewşê baş dişopînin, lê hê jî hin firoşkar dûrî lîsteyê ne. Ji bo wê jî di dema pêş de emê hewl bidin vê cûdahiyê ji holê rakin û çareseriyeke quncaw jê re bibînin.

# 'Ajokarên buhayê zêde ji welatiyan bigrin wê bên cezakirin'

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Xelîl Yûsif diyar kir ku buhaya veguhestina weletiyan bi erebeyên veguhestina hundirîn di nava Qamişlo de 500 lîreyên Sûrî ye û ajokarên ku zêdeyî vê buhayê bigrin wê bên cezakirin. Herwiha ji welatiyan xwest ku zêdeyî 500 lîreyê nedin.

Bêyî ti biryareke fermî ji Mekteba Veguhestina Hundirîn ya Şaredariya bajarê Qamişlo, hin ajokarên erebên veguhestina hundirîn yên di navbera taxên bajarên Qamişlo de kar dikin, buhayê veguhestina welatiyan li şûna 500 lîreyên Sûrî, 1000 lîreyî ji welatiyan digrin.

Hin ajokaran bi hicetên cûda yên wekî nebûna banzînê , bilindbûna bûhaya çakirina erebeyan û bilindbûna nerxê dolar, buhayê veguhestinê zêdeyî ya fermî ji welatiyan digrin.

Ji bo pêşîgirtina li ber vê bûyerê, Mekteba Veguhestina Hundirîn ya Şaredariya gel ya bajarê Qamişlo û bi alîkariya Tirafîka Qamişlo, Yekîtiya Ajokarên Qamişlo û Zabîta Desteya Veguhestinê ya Desteya Şaredarî û Ekolojî ya bajarê Qamişlo, dest bi hemleyekê di nava bajarê Qamişlo de kirin û hîn jî ev hemle dewam dike. Di hemleyê de gelek ajokarên erebeyên veguhestina hundirîn yên ku buhaya zêde ji welatiyan digirtin hatin seza kirin.

Li sere mijarê rêveberê Mekteba Veguhestina Hundirîn Ya Şaredariyta Gel Ya bajarê Qamişlo, Xelîl Yûsiv ji me re axivî û diyar kir ku hin ajokarên veguhestina hundirîn yên bajarê Qamişlo bi serê xwe buhayê veguhestinê ji welatiyan zêde distînin û wiha got: "Hin ajokar bi hinceta bilindbûna nerxê banzînê , ji bo veguhestina welatiayan daxwaza 1000 lîreyî dikin. Lê hincetên wan ne di cihê xwe de ne. Ajokar her heftiyekê , 75 lître banzîn ya bi nirxê 210 lîreyan digrin û ev qasey ji banzînê têra wan dike. "

Xelîl Yûsiv da xuyakirin ku ji bo pêşîgirtina li ber stendina pereyên zêde ji welatiyan, wan dest bi hemleyekê kirin û wiha dewam kir: "Detpêkê me dest bi hemleyek hişarîkirinê ji bo ajokarên veguhestina hundirîn kir û me civîn ji wan re çêkirin. Lê hin ajokaran di girtina pereyên zêde yên ji welatiyan dewam kirin. Ji ber wê me dest bi hemleyekê kir û di hemleyê de gelek ajokar hatin seza kirin. Wê ev hemle ji bo demeke dirêj dewam bike."

Xelîl Yûsif da zanîn ku ajokar beşek pir girîng ji civakê ne û wiha got: "Her kesê ku li ser xaka xwe maye û xizmeta gelê xwe dike ew berxwedêre. Ajokarên me jî beûek pir girîng ji civakê ne û xizmeta gelê xwe dikin, nabe ti kes



ziyanê bighîne welatian û biriyaran binpê bike. Em di rewşeke awarte re derbas dibin û divê her kes li gorî wê tevbiger e."

Rêveberê Mekteba Veguhestina Hundirîn Ya Şaredariyta Gel Ya bajarê Qamişlo, Xelîl Yûsiv bang li welatiyên Qamişlo kir ku zêdeyî 500 lîreyî nedin ajokarên veguhestina hundirîn û axaftina xwe wiha qedand: "Em ji welatiyan dixwazin ku zêdeyî 500 lîreyê buhaya veguhestinê nedin ajokarên veguhestina hundirîn, ajokarên ku zêdeyê 500 lîreyî bixwazin, wê bên seza kirin. "



**Pirsgirêkên Kurdên Misilman**

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Di roja meya îro de, Kurdên misilman ji ber nakokiyên xwe, pirsgirêkên wan yên cidî di têgaheştina ol û neteweyê de hene; di nava pirsgirêkên welatperweriyê de mane. Kurdên misilmanên yên dema niha, tevlîhevîyên bîrdozî jiyan dikin. Kurdên misilman yên dema niha, di bin bandora misilmanên ku deśthilatdar û xwedan dewletin de mane. Mafên ku Xweda û Qur'an a pîroz misoger kirine, ne li gor wan mafan tevdigerin. Berovajî wê, dewletên dagirker û qirker li ser navê ol çidibêjin, Kurdên misilman zêdetir wê dişopandin û hezdikin.

Kurdên misilman ji ber ku, Qur'an a pîroz naşopînin; Bi hişmendîyek berpirsiyar tevnagerin, dîroka medreseyên xwe, lehengîya alim û rêberên xwe lêkolîn nakin. Tiştên ji dagirkerên xwe li ser ola isalmî dibîhîzin, digrin deśt. Bi vî awayî jiyanekê binav Îslamî ku naverok wê dijiyatiya Îslamê ye jiyan dikin û pêşdixin .

Di dîroka Kurd û Kurdîśtanê de, cîhê alîmên oldar cîhekî serekeye

Alimên Kurd gelekî xizmeta ola Îslamê, di warê zaniśtê de kirin, pirtuk û şîroveyên pêşketî çêkirin.

Alimên Kurd di dîroka nêz û durde ji bo gele xwe û raśtiya ol bi lehengî tevgeryane. Wekî mînak jî; Şêx Mehmud Berzencî, şêx Seîdê Pîran, Seyîd Riza, Seyîd Abdulkadir, Qazî Mihemed, şêx Ehmed Berzanî, mele Muśtafa Berzanî, mele Sidîq Turhallî, mele Îzedîn Yildirim, şêx Mihemed Emîn Bîngol, şêx Maşuqê Xeznewî û gelek alimên din ku bi xwîn û keda xwe ji bo gelê xwe têkoşiyane û şehîd bune. Ev jî dide dîyarkirin ku, pirsgirêka Kurdên misolman di hişmendî û bîrdoziyê de ye. Pirsgirên ne olî, berovajî wêkî pirsgirêkên olî binav dikin û di bin bandora dagirkerande dimînin.

Piştî perçekirina xaka pîroz, hişê Kurdên misilman jî hatiye perçekirin. Li Şuna Îslamê de, ola dagirker û deshelatdaran wek ola Îslamê di hişên wan de hatiye çandin.

Ola ku dibe sedema pirsgirêkên bi kurahî tên jiyan kirin, bingeha xwe ji berovajîkirina deshelatdaran ya ji Îslamê re girtiye.

Kurdên misilman bi navê ola Îsalmî hin mafan ji xwer heram û derveyî dîn dîbîne, lê ji dagirkerên xwe re wekî tiştekî pîroz dibîne û bi navê ol ji wî tiştî re xizmetê dikin.

Ew tiştên ku ji bo Filîśtîniyan, Bosniyan, Afganan u hemu gelan pîroz e, lê heman tişt ji bo gelê Kurd û Kurdîśtanê heram e. Ango daxwaza azadiya Kurdîśtanê weke fitne û perçebunê binav dikin.

Mele û Şêxên ereban û farisan ji bo welatê û gelê xwe biparêzin, di dîrokê de tekoşînek bê hempa dane meşandin.

Kurdên misilman ji bo ku gele Kurd neghêje mafên xwe, olê berovajî dikin û bi navê ola Îslamê zilm, zordarî û şideta deshlatdarên xwe wek tevgerek pîroz û olî binav dikin.

Pirs ev e: Gelo tekoşîndayîna ji bo gel û welat ne emrekî olî ye?

Oldar û em Kurdên misilman jî , bawer dikin ku cudayî di navebera misilmanên netewên din û me de heye?

Ger welatperwerî ne emrekî olî be, çima zanyarên Ereb, Faris, Tirk û alimên berê yên Kurdan ev tekoşîn binavê ola Îslamê pêkanîne?

Pirsgirêka Kurdên misilman ewe ku, çiqas dirin ji raśtiya ola Îslamê dur dikevin û ser navê ola Îslamê nêzî ola deshilatdarên zalim dibin.

Belê tekoşîna ji bo azadî û rizgarkirina welat pîroze, kîjan misilman vê yekê pêk neyîne, ne misilmanekî raśt yê ola Îslamê ye, wê demê ew piştgirê ola dagirker û qirkeran e.



# Partî û saziyên Kurdan yên li Ewropayê: Berxwedana li Zap û Metîna berxwdaneke netewî ye

## Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê diyar kirin ku divê êrişa li ser gerîla ya li Xelîfanê bê ronîkirin. Herwiha bang li gelên Kurdiśtanê kirin ku li dijî dagîrkeriya tirkî berxwedanê bilin bikin.

**Navenda nûçeyan**

52 partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê derbarê êrîşa li Xelîfanê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê di daxuyaniya xwe de dan zanîn ku berxwedana gerîla ya li Zap û Metîna berxwedaneke neteweyî û wiha gotin: "Dewleta Tirk a dagirker ne tenê li dijî gerîla, êrîşî hemû nirx û destkeftiyên Kurdan dike. Geşedanên dawî me weke sazî û partiyên Kurdistanî yên li Ewropayê dixe li nava fikaran. Ev geşedan zirarê dide berjewendiyên netewî yên gelê Kurdistanê."

Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê dan diyar kirin ku dema gerîlayên azadiyê li hemberî planên qirêj ên artêşa Tirk a dagirker serkeftinên mezin bi dest dixin, li herêmên Başûrê Kurdistanê li dijî gerîlayên azadiyê êrîş pêk tên. Mîna êrîşa yekem ya 26'ê Tîrmeha 2021'an û ya duyemîn di 29'ê Tebaxa 2021'an de, niha jî ya sêyemîn di 5'ê Îlona 2022'an de pêk hat. Di van her sê êrîşan de heta niha bi giştî 12 gerîlayên azadiyê şehîd bûne. Ev her sê bûyer jî li benda zelalkirin û lêkolîneke cidî ne.

Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê dan zaîn ku divê ev bûyer bê ronîkirin û bi lezgîn her du gerîlayên birîndar radestî yekîneyên wan bên kirin û wiha gotin: "Eger ev yek pêk neyê wê zerarê bide destkeftiyên Kurdistanê û rê li ber polîtîkayên komkujî û dagirkeriyê yên dewleta Tirk a mêtînger li Kurdistanê veke."

Partî û saziyên Kurdan ên li Ewropayê banga hemû gel û aliyên Kurdistanê kirin ku li hember siyasetên dagirker û qirker yên dewleta Tirk a mêtînger yên li ser Kurdistanê, bi ruhê yekitiya netewî, ji berjewendiyên netewî yên gelê Kurdistanê berxwedanê bilind bikin.

# YPS/YPS JIN: Tevlî pêngava serfiraziyê bibin

**Navenda nûçeyan**

**Koordînasyona YPS/YPS JIN'ê bîlançoya çalakiyên meha Tebaxê eşkere kir û got, di sala 50'yemîn a têkoşînê ya Rêbertiya me de, em bang li gel, ciwan û jinan dikin ku bi awayekî çalak tevlî pêngava serfiraziyê ya YPS'ê bibin."**

Koordînasyona YPS/YPS JIN'ê bi daxuyaniyeke nivîskî de bîlançoya çalakiyên meha Tebaxê eşkere kir. Di daxuyaniyê de li dijî faşîzma dewleta tirk sunda tol rakinê hat dayîn û wiha hat gotin:

"Di sala 50'emîn a têkoşînê ya Rêber Apo de, rêxistina YPS û YPS JIN'ê pêngava serfiraziyê di 10'ê Tebaxê de bi şîara 'Pêngava Serfiraziyê' ya sala têkoşîna 50'emîn da destpêkirin. Di sala 50'emîn a têkoşînê ya Rêber Apo de Pêngava Serfiraziyê ya ku YPS'ê daye destpêkirin, heta ku rejîma AKP û MHP'ê ya faşîst were hilweşandin û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were, bi ruhê têkoşînê yê heval Çiyager û Zeryan wê bidome. YPS û YPS/JIN a ku tarza têkoşîna rêxistinkirî ya gelê şoreşger û welatparêz e, wê bi encameke mûhteşem, hesap bipirse û tola gelê Kurd ji faşîzmê bipirse."

**Çalakiyên Meha Tebaxê**

Bîlançoya çalakiya meha Tebaxê wiha ye:

"Tîmên tolhildanê yên Şehîd Gunduz Akmeşe di 4'ê Tebaxê de li Girtîgeha Tîpa D ya Amedê du caran bi bombeyên destan li wesayîta gardiyanekî xistin.

Tîma Tolhildanê ya YPS-JIN'ê ya Şehîd Cûdî Faraşîn 6'ê Tebaxê li dijî wesayîteke zirxî ya polîsan a li Wanê digeriya bi bombeyên destan çalakiyek li dar xist.

Tîma Tolhildanê ya Şehîd Têkoşîn Farqîn a YPS'ê di 9'ê Tebaxê de li Amedê li dijî mala bazirganên tiryakê çalakiyek li dar xist.

Tîmên tolhildanê yên YPS, YPS-JIN'ê bi wesîleya 15'ê Tebaxê roja berxwedanê ya li Kurdistanê bi fîşekên hewayî, nivîs û şewitandina alan çalakî li dar xistin.

Di 21'ê Tebaxê de tîmeya tolhildanê ya Şehîd Serxwebûn li Agiriyê li dijî wesayîta dewriye ya dijmin çalakiyeke mayinî li dar xist.

Tîma Tolhildanê ya Şehîd Vejîn Zana ya YPS-JIN'ê, Îdrîs Dirî ku di şehadeta Welat û Nîdal de ku di sala 2020'an de li gundê Kelê yê Geverê şehîd bibûn tiliya wî heye û sîxûrê dewleta faşîst bû di 21'ê Tebaxê de bi çalakiyek ceza kir.

Tîmên tolhildanê yên Şehîd Dilgeş Azad 26'ê Tebaxê li Wanê li trafoya ceyranê ya VEDAŞ'ê xistin û bêbandor kirin.

Di 27'ê Tebaxê de çawîşê pispor Turgay Kulcû ji aliyê tîmên



Tîmên Tolhildanê yên YPS-JIN'ê yên Şehîd Çekwar Çubuk 12'ê Tebaxê li navçeya Bismilê ya Amedê li dijî BÎM'ê bi fîşekên hewayî çalakiyek li dar xistin.

Di 13'ê Tebaxê de li navçeya Dêrikê ya Mêrdînê tîmên tolhildanê yên Şehîd Ronahî Nisebîn a YPS-JIN wesayîta cerdevan û endamê AKP'ê Naşît Temellî şewitandin.

Tîmên tolhildanê yên YPS, YPS-tolhildanê yên Şehîd Alî Tolhildan ve li Dîlokê hate cezakirin.

Di şeva 30 û 31'ê Tebaxê de saet 24.00'an de li navçeya Ben û Sen a Amedê, tîmên tolhildanê yên Şehîd Mahîr Andok bi bombeyên destan li dijî Rêber Îyisoylu û kesên derdora wî yên ku tiryakê difroşe û sîxûrî dike çalakiyek li dar xist."

# HPG: 6 dagirker hatin cezakirin, çeperek û dronek hate îmhakirin

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê da zanîn ku di 13 çalakiyên de ku di 7,8,9'ê Îlonê hatine kirin, yek jê payebilind herî kêm 6 dagirker hatine cezakirin, çeperek û dronek jî hatine îmhakirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir li hemberî berxwedana gerîlayan dagîrkeriya dewleta tirk ya faşîst, bi çekên kîmyewî û taktîk nukleer êriş dike û sûcên şer berdewam dike.

Daxuyaniya Navenda Ragihandina HPG'ê wiha ye:

"Artêşa Tirk a dagirker hemû derfetên xwe yên ekonomîk, leşkerî û siyasî ji bo şikandina berxwedana gerîlayan bi kar tîne û pê re jî bi bombeyên taktîk nukleer ên şîddeta wan zêde, çekên kîmyewî, balefirên şer, helîkopterên êrîşê, hawan û



obusan Qadên Berxwedanê bombe dike. Artêşa Tirk a dagirker exlaqê şer û hiqûqa wê nas nake û li pêş çavê dinyayê sûcê şer ên di dîrokê de herî mezin de dike û Qadên Berxwedanê bi bombeyên taktîk nukleer û çekên kînyewî bombe dike. Artêşa Tirk a dagirker Qadên Berxwedanê 13 caran bi bombeyên taktîk nukleer û çekên kîmyewî, 6 caran bi balefirên şer, 10 caran bi helîkopterên êrîşê û bi dehan caran jî bi obus û çekên giran bombe kiriye.

Di 13 çalakiyên hêzên me de yek jê payebilind herî kêm 6 dagirker hatine cezakirin, çeperek û dronek jî hatiye îmhakirin."

# HBDH'ê çalakiyeke sabotajê li dar xist

**Navenda nûçeyan**

**Milîsên Rêzan Amed ên HBDH'ê ji bo silavkirina girtiyên li zindanan li ber xwe didin li fabrîkeya ta û dezî çalakiyeke sabotajê kir.**

Milîsên Rêzan Amed ên HBDH'ê ji bo silavkirina berxwedana zindanan, di saetên pêşîn ên 6'ê Îlonê de bi sabotajê fabrîkeya ta û dezî ya li Gebzeya Kocaeliyê şewitand û Ji ber şewatê xisareke mezin di fabrîkeyê pêk hat.

Milîsên Rêzan Amed ên HBDH'ê diyar kirin ku milîsên wan ji bo silavkirina berxwedana zindanan çalakiyên xwe didomînin. Herwiha dan zanîn ku Ji bo silavkirina hevrêyên wan yên li zindanan û bîranîna hemû şehîdên wan yên zindanê, wan li Gebzeyê çalakiyeke sabotajê kir.

Milîsên Rêzan Amed ên HBDH'ê dan xuyakirin ku wan di salvegera şehadeta heval Kemal Pîr ku di rojiya mirinê ya di sala 1982'an de nemir bûbû, ev çalakî li dar xist. Herwiha dan zanîn ku ew bi vê çalakiyê berxwedana li zindanan silav dikin.

Milîsên Rêzan Amed ên HBDH'ê diyar kirin ku ew soz didin hemû gelê xwe ku di serî de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê ku li Zindana Îmraliyê li ber xwe dide, ew ê hemû girtiyên şoreşger azad bikin.

# Li Efrînê nasnameya kurdan ji holê tê rakirin

**Têkildarê avakirina mêtingeriyê li kantona Efrînê, Erîfa Bekir diyar kir ku dewleta tirk û rêxistinên alîgirê wê yên di Efrînê de, bi avakirina mêtengeriyê dixwezin nasnameya gelê Kurd ji hole rakirin.**

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**



Ji bo gelê Kurd nebin xwedî maf wek hemû gelen, dewleta tirk ya dagîrker, ji hemû aliyan êriş dike. Dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên girêdayî wê di 20'ê çileye 2018'an de, Efrîn kir hedef û êrîş kir. Beriya dewleta tirkî êriş bik, Rûsyayê hêzên xwe kişandin ku bi rehetî dagîrkerî pêk bê. Bi alîkariya Rûsyayê û bêdengiya hêzên navneteweyî, dewleta tirk berê çeteyên xwe dan ser kantona Efrînê. YPG û YPJ'ê bi piştgirya gel li dijî çekên herî giran, 58 rojan li ber xwe dan. Lê di encama êrişan de, nêzî milyonek welatî bi darê zorê koçberî herêm û kantonê din bûn.

Niha jî dewleta tirk ya dagîrker bi avakirina mêtingeriyê, hewl dide ku nasnamya gelê Kurd wenda bike û li ser xaka kurdan pêkhateyên cûda bi cî dike.

Di çarçoveya guhartina demografiya kantona Efrîna dagîrkirî, rêxistinên Îxwanî yên bi navên "Xeyrî" û bi fermana yekser ji dewleta tirk ya dagîrker ji bo berfirehkirina projeya avayiya mêtingehiyê li navçeya Cindirêsê, hê jî berdewam me.

Saziya Rêxistina 'Wefa El Muhsenîn' beşekî ku ji 34 malan pêk tê, li navçeya Cindirêsê ya Efrînê ava kir û koçberan bi cih dike. Herwiha saziyê beriya çend hefteyan ve dest bi avakirina 2'yem ya avayiyê mêtingeriyê ku ji 80 malî pêk tê kiriye.

Piraniya koçberên di avayiyên mêtingeriyê bi cih dibin, xelkê Filestînê ne. Navê avayiyên mêtingeriyê ku lê bi cih dibin, navê gundê xwe lê dikin. Wek `El-Zeîm` ku navê gundekî li Filestînê ye.

Têkildarê mijarê, Endama Destaya Bicêhkirinê ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Erêfa Bekir, ji me re axivê û got bi saya xwîna şehêdan û kede gel gelek sazê vekirin û Rêveberiya Xweser îlan kirin.

Erîfa axaftina xwe wiha domand: ``Piştî derketina rejima Sûriyê ji bajarê Efrînê, di hemû qadên jiyanê de me xebatek pir baş da meşandin. Lewra me, ji nû ve bajarê xwe bi fikir û rêxistina xwe, ava kir. Herwiha hêjaye bibîrxistinê miletê ku ji ber êrişên rejimê direviyan, mîna li Şam, Heleb, Hema û heta xelkê Filestînî jî, Efrînê ew pêşwazê kirin. Me pariyê nanê xwe bi wan re parvedikir.``

**`Jiyanek bi êş dijîn`**

Erîfe diyar kir ku ji destpêka dagîrkirina bajarê Efrînê û heta roja îro, dewleta tirk ya dagîrker sûcê herî hovane, li wir dike; Tecawûzkirina jinan, revandina mirova, kuştina zarokan, zewaca bi zorê, birandin û firotina darên zeytûna, xirabkirina şînwarê dîrokê û hwd..



Erîfe axaftina xwe wiha domand: "Kiryarên ku dewleta tirk ya dagîrker di hindirê Efrînê de dike, li dijî mirovayiyê ye. Lewra ew mal û milkê xelkê ku bi sed salane, bi keda xwe ava kirîne, dewleta tirk hemûyê bi rêya çeteyên xwe re jêdistîne û xirab dike."

**`Bi kiryarên xwe yên qirêj, demografiya herêmê diguherî ne`**

Li ser projeya avakirina mîtêngeriyê Erîfa wiha got: ``Dewleta tirk ya dagîrker bi kiryar û êrişên xwe yê li dijî miroviyê, piştî berxwedana 58 rojan, nêzî milyonek welatî bi dare zorê ji Efrîn derxistin û li şûna wan, malbatên çeteyên xwe bi cih kirin. Qunaxa yekê nêzî 250 malbatên çeteyan di hundirê kampan de, bi cî kir. Qunaxa duduyan dest bi avakirina mêtingehiyê kir. Projeya avakirina wan ya mêtingehiyê, projeyek pir xeter binirxîne. Lewra dewleta tirk û rêxistinên girêdeyî wê, dixwazin bi avakirina mêtingeheyê, demografiya Efrîn biguherîne û nasnameya gelê Kurd wenda bike.``

**Li dijî Efrîn komploya navneteweyî**

Erîfa dagîrkirina Efrînê wek Komployek Navneteweyî nirxand. Erîfa destnîşan kir ku, rêxistinên li Efrîn qaşo yên bi navê alîkariya mirovî bi cî dibin, girêdayî dewleta tirk û hevalbendên wê ne. Herwiha Erîfa diyar kir ku ev rêxistine, ji karê mirovayiyê dûrin û ew bi biryarên dewleta tirk karê herî qirêj, dikin. Endama Destaya Bicêkirinê ya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Erîfe Bekir, axaftina xwe wiha qedand: "Bêdengiya dewletên navneteweyî, tê wateya hevkariyê. Lewra tevî qedexekirina ragihandinê li Efrînê, kiryarên dewleta tirk û çeteyên wê yên li dijî mirovayiyê, li ber çavê tevayîya cîhanê tê dîtin. Lê çima bêdengin! Ji bo gelê me yên di welat û yên dervî welat, banga me ewe ku li dijî kiryar, siyaset û êrişên dewleta tirk, li qadan çalakiyan pêk bînin. Lewra eger em li xak û li xwîna şehîdên xwe xwedî dernekevin, ti kes li me xwedî dernakeve.

## Darbeya Leşkerî ya 12'ê Îlonê



**Farûk SAKIK**

Berî 42 salan, Tirkiyê deriyên xwe ji tariyê re vekiribûn. Û vê tariyê zarokên wan xwar. Kujerên zarokan dibûn desthilatdar. Navê vê tariyê "12 Îlonê" derbasî rûpelên dîrokê bû. Darbeya 12'ê îlonê ne tenê li ser Kurdan, an jî li ser hezên demokratîk ên Tirkan bû. Di heman demê de li ser kesayetiya mirovan, kesen şoreşger û demokratan jî birînên kûr vekir.

Di vê merhaleyê de Çepgirên Tirkiyeyê bi temamî ji siyasêtê dûr ketin û li Bakurê Kurdistanê jî şoreşeke bê dawî hate destpêkirin.

Sal 1980 rojek payizê, 12 Îlonê, serê sibê, seat çar. Di kolanên hemû bajarên Tirkiyê de dengê Tanq û leşkeran, di radyo û di Televizyonan de jî dengê marş û daxwiyaniyên derbeya leşkerî bilind dibûn.

Ew roj jiyan sekinîbû, mîladek nû destpêkiribû û bi salan êdî herkes wê bêje berî 12 Îlonê û piştî 12 Îlonê.

Di siyaset û di jiyana Tirkiyê de pêvajoyek nû dest pê dikir.

Roja 12 Îlonê Kenan Evren di daxwiyaniya xwe de behsa edalet, wekhevî, azadî û rojê xweş dikir. Lê di heman seatan de leşker û polîsên wî, di kolanan de li niçîra şoreşgeran bûn.

Berî 12'ê Îlonê li Kurdistanê jî nivşek nû derketibû. Komel û rêxistin dihatin damezirandin. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd û ji bo Kurdistaneke azad di nav hewldanan de bûn. Yek Ji van rêxistinan jî PKK bû. Di 28 Mijdara sala 1978'an, di bin rêberiya Abdullah Ocalan de, damezirandina PKK'ê hatibû îlankirin.

Îtîbar û girîngiya vê partiyê di nava gel de li gor rêxistin û partiyên din cûda bû.

Piştî ku damezirandina PKK hate ragehandin û xebatên wê yên di nav gel de dest pê kirin, dewleta Tirk kete nav hewldanekî qirêj. Bi du tasfîyekirina ve tevgera nû ketibû. Bi dehan endamê vê tevgerê hatibûn girtin û li zîndana Amedê bûn.

3 Girtîgehên pîlot hattibûn tespêt kirin. Mamak, Metrîs û Amed. Li van 3 girtîgehan li hember girtiyan, êşkenceyên bê emsal dihatin kirin. Gelek kes di van girtîgehan de bi van êşkenceyan jiyana xwe ji dest dan. Gelek kes jî seqet man. Hemû girtî bê darizandin bi salan li van girtîgehan de hatin girtin.

Darbekaran ji bo bighêjin armanca xwe çi ji dest wan dihat dikirin. Li zindana Amedê siyasetek taybet dihat meşandin, êşkence êdî derketibû merheleyek wisa ku ne dihat pênase kirin.

Kadro û pêşengên PKK'ê li zîndanê dinav lêgerîna berxwedanê de bûn. Li girtîgehên leşkerî yên Amedê, Elezîz û Meletyeyê bi dehan welatparêzên Kurd, di greva birçîbûnê û di rojiya mirinê de jiyana xwe ji dest dan..

Bi taybetî li girtîgeha Amedê, bi hatina Esat Oktay Yildirim darbekaran dixwestin tevgera kurd di vê zîndanê de biqedîn in. Navê Kurd û Kurdistan bi salan qedexebû, ti kesî ev herdû peyv bikar nedianîn.

Li girtîgehan de di bin rêberiya pêşengên PKK'ê de berxwedanek mezin hatibû destpêkirin. Mazlum Dogan, Kemal Pir, M. Hayrî Dûrmûş û hwd. di zindanan de di berxwedanê de şehît ketin.

Berxwedana wan bi şahadetan gihîştibû armanca xwe. Peyamekê mezin dan derve. Ev peyam li derve hat dîtin û xwendin.

Wê demê li derva hê jî bêdengiyek mezin hebû. Lê di 15'ê Tebaxê de di bin pêşengiye PKK'ê de şerê çektarî hat destpêkirin. Berxwedana zîndana Amedê gihîştibû armanca xwe. Tevgera PKK'ê pêvajoya xirab dabû seknandin. Li dijî vê Cûntayê rihek nû afirandibû. "Berxwedan Jiyane"



# 'Bi berxwedanî û têkoşîna gel wê têkbirina tecrîdê misoger bibe'

**Welatiyên kantona Efrînê tecrîda li ser Rêber Apo şermezar kirin û diyar kirin ku armanca tecrîdê tinekirina gelê Kurd û têkbirina hêza jinê ye. Herwiha dan zanîn ku bi xurtkirina têkoşînê wê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo misoger bibe.**

**Zana Roj/Şehba**

Rêberê gelê kurd abdullah Ocalan ev 24 salin ji aliyê dewleta tirk a dagirker ve hatiye girtin, Rêber Apo ji bo azadiya gelê kurd û tevahî gelên bindest di girtîgeha Îmraliyê de têkoşîneke bê sînor dide meşandin. Hêzên hegemon xwestin bi girtina Rêber Apo îradeya gelê Kurd biçewisînin û tune bikin, lê ji ber têkoşîna dîrokî ya Rêber Apo û berxwdana şervanên Tevgera Azadiyê ya bê hempa, ew hêz negihiştin armanca xwe. Herwiha Tevgera Azadiya Kurdistanê bi sekna li hemberî êrişên dagîrkeriyê, îsbat kir ku bi dîlgirtina Rêber Apo, fikr û felsefeya wî sînordar nabe. Welatiyên bajarê Efrînê tecrîda giran ya ser Rêber Apo şermezar kirin û diyar kirin ku bi têkoşîn û berxwdana gelê Kurd wê tecrîd bê şkandin û faşîzma AKP'ê wê hilweşe.

**'Felsefeya Rêber APO deriyê ronîkirina Rojhilata Navîn e'**

Welatiyê bi navê Luqman Hesen Komploya Navneteweyî ya li ser Rêber Apo şermezar kir û wiha got: "Tevayiya gelên Rojhilata Navîn, dizanin ku felsefeya Rêber Apo ji bo pirsgirêkên wan bingeha çareseriye ye. Lê ji ber ku felsefeya azadiyê ya Rêber Apo nakeve xizmeta berjewendiyên hêzên desthilatdar û kapîtalîzimê, wan Komplyeke Navneteweyî li hemberî Rêbertî pêk anîn û ev komplo bi serpereştiya Amerîka û Israyîlê hat dest pê kirin."

**'Rêber APO dîroka têkoşîna gelê Kurd vejîn kir'**

Luqman Hesen diyar kir ku Rêber Apo dîroka gelê Kurd a ku bi sedê salan e ji aliyê dijminên gelê Kurd ve hatiye çewisandin ji nû ve vejîn kir û axaftina xwe wiha dewam kir: "Rêber Apo ji bo gelê Kurd û tevayiya gelên azadîxwaz projeya Neteweya Demokratîk pêşkêş kir. Ev proje li Rojhilata Navîn bû bingeha azadiya gelan."

**'Kes nikara felsefeya Rêbertî tune bike'**



Luqman balkişand ser tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo û axaftina xwe wiha qedand: "Ev demeke dirêje ku dewleta Tirk a dagirker, rê nade ku parêzer û malbata Rêber Apo hevdîtinê pê re bikin. Dewleta Tirk ya dagîrker dixwaze têkiliya Rêber Apo bi gelê Kurd re qut bike û felsefeya azadiyê tine bike. Lê divê dewleta tirk ya dagirker bizanibe ku fikir û felsefeya Rêber Apo, di dil û mejiyê her Kurdekî welatparêz de ye û ti kes nikare wê felsefeyê tine bike"

**'Bi saya felsefeya Rêber Apo jina kurd bû pêşenga jinên azadîxwaz yên cîhanê'**

Welatiya bi navê Reşîda Mihemed jî tecrîda ser Rêber Apo şermezar



kir û diyar kir ku bi saya fikrê Rêber Apo yê azad, jina Kurd bû pêşenga jinên azadîxwaz li tevayiya cîhanê û axaftina xwe wiha domand: "Bi saya fikrê Rêber Apo, jina Kurd ji bindestiyê bû pêşenga civakê û sembola jina azad. Armanca tecrîda li ser Rêber Apo, şkandina îrade û hêza jinê ye. Dewleta tirkî ya dagirker wê ti carî nikaribe xwe li ber fikir û têkoşîna Rêber Apo bigre û armanca xwe bi dest bixe." Reşîd Mihemed bang li tavayiya rêxistinên mafên mirovan kir ku bi erkê xwe yê exlaqî rabin û çavê xwe ji kiriyarên neexlaqî yên dewleta tirk ya faşîst negrin. Herwiha bang li gelê Kurd kir ku têkoşîna li hemberî faşîzmê bihêztir bikin û li ser fikrê rêber Apo meşa azadiyê dewam bikin.

# 'Rêveberiya Xweser kilîta çareseriya aloziya Sûriyê ye'

**Şaho Gabar / Qamişlo**

**Besam Seqir: Aloziya Sûriyê bi riya diyaloga Sûrî–Sûrî tenê çareser dibe û kilîta çareseriyê jî li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Lewra gelên herêmê tevan himbêz dike.**

Dirêjbûna aloziya Sûriyê rûyê hêz û aliyên ku bi navê xizmeta gelê Sûriyê xwe nîşan didin û li gorî berjewendiyên xwe aloziya Sûriyê bi kar tînin, eşkere kir. Di serî de dewleta tirkî, ji wan hêzan ku ji wêranî û astengkirina çareseriya kirîza Sûriyê pêve, tiştek bi xwe re neanî. Li hemberî wê tevî zor û zehmetiyên gelên herêmê li ser ragihandina Rêveberiya Xweser di 21'ê Çileya 2014'an de, li herêmên Cizîrê, Kobanê û Efrînê li hev kirin û li dor bûn kom. Piştî şikandina Hêza çeteyên DAIŞ'ê û rizgarkirina piraniya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê li ser destê QSD'ê, di 6`ê Îlona 2018`an de Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li bajarê Eyn Îsa hat ragihandin. Projeya Rêveberiya Xweser di nava aloziya Sûriyê de, bû nimûneya demokrasî, jiyana hevbeş û modela çareseri yê.

Li ser girîngiya projeya Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina tevayiya pirskirêkên Sûriyê û xizmeta gelan, nûnerê Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) yê li Wanşington'ê, Besam Seqir ji me re axivî û got: "Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê herêmeke fireh ya Sûriyê bi rêve dibe û nûnertiya gelê herêmê dike. Hêzên Sûriyaya Demokratîk (QSD) herêm ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kir û aramiya deverê parast. Tevayiya hêzên ku beşdarî kirîza Sûriyê bûne, dizanin ku bê beşdarbûna Rêveberiya Xweser wê ti çareserî ji krîza Sûriyê re neyên dîtin."

**'Rêveberiya Xweser li ser fikrê Neteweya Demokratîk hat avakirin'**

Besam Seqir diyar kir ku projeya Rêveberiya Xweser li ser bingeha felsefeya Netewa Demokratîk hat avakirin û wiha got: "Di sala 2011'an de, gelên li Sûriyê li hember polîtîkayên dewleta navendî serî rakirin. Piştî ku hêzên navneteweyî û herêmî li gorî berjewendiyên xwe destwerdan li krîza Sûriyê kirin û komên îslamî yên radîkal ji çar aliyên cîhanê derbas kirin, ev bû sedem ku tevgera gel ji rê, armanc û daxwazên xwe dûr bikeve. Ji ber wê jî Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kir. Tevayiya gel û pêkhateyên Rojava di hemû waran de ji bo xizmeta herêma xwe, xwe birêxistin kirin. Ev bû bingeh û destpêka ragihandina projeya çareseriya demokratîk a ji bo Sûriyê. Rêveberiya Xweser li ser bingehên civakî û fikir û felsefeya Neteweya Demokartîk hate avakirin. Herwiha ji bo hemû pirsgirêkên li Sûriyê û herêmê, bû modeleke çareseriyê."

**'Dagîrkeriya tirkî ji bilî wêraniyê tiştekî nayîne'**

Besam Seqir balkişand ser hewldanên dewleta tirkî ya dagîrker yên ji bo têkbirina Rêveberiya Xweser û wiha got: "Ji ber ku projeya Rêveberiya Xweser projeyeke demokratîk e, xizmeta çareseriyê dike û hêviyê dide gelên Sûriyê, hêzên dagîrker hewl didin têk bibin. Dagîrkeriya tirkî vê projeyê li ser desthilatdariya xwe xeter dibîne, li dijî wê her rêbazî bi kar tîne. Siyaseta wê zelal e; Projeya Biratiya Gelan ya demokratîk û aştîxwaz ya li ser bingehê wekhevî û edaleta civakî ava bûyî, qet qebûl nake. Eşkere dibêje, 'hebûna statûyeke demokratîk ji me re xeter e'. Ji ber wê gef û êrişên wê yên dagîrkeriyê yên ser herêmê wê di rojevê de bin."



**'Bi hevgirtin û yekîtiya gelên herêmê wê dagîrker têk biçin'**

Endamê Desteya Rêveber ya Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) li Waşingtonê, Besam Seqir ji gelên herêmê xwest ku piştgiriya Rêveberiya Xweser bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tê xwestin k, li destkeftiyên xwe yên şoreşê xwedî derkevin û tevlî nava têkoşîna azadiyê bibin. Divê her kes di her alî de xwe bi rêxistin bike. Yekîtiya gelên herêmê wê dagîrkeran ji holê rake. Ez bi hêvî me ku hêrêm ber bi aramiyê ve biçe û gelên herêmê azad bijîn."

FENER

## Berxwedanê Heqîqeta Faşîzma Tirk Rût Kiriye



**Idrîs HENAN**

Her rojek ji ya berê zêdetir dixuye ku siyasetên Tirkiyê li hemberî herêmê neguherîne û ne jî tên guhertin. Tevî hemû hewlên wê yên nêzîkbûna bi welatên Ereb re û idiayên têkîliyeke bê şert û merc ku destwerdana karûbarên navxweyî yên welatên Ereb neke, lê bi daxuyaniya xwe ya li dijî encamnameya civîna pêncemîn a Komîteya Wezîran a têkildarî şopandina destwerdanên Tirkiyê di karûbarên navxweyî yên welatên Ereb de ya bi serokatiya Misir û endamtiya Erebistana Siûdî, Îmarat, Behrên û sekreterê giştî yê Komkara Erebî, Ehmed Abûl Xeyt, bandora berdewamiya helwestên Erebî li dijî Tirkiyê diyarker bû.

Komîteya Wezîran di daxuyaniya xwe de tekezî li biryarên Komkara Erebî yên berê, kir. Herwiha fikarên xwe ji hebûna leşkerî ya Tirkiyê li ser xaka hinek welatên Ereb, binpêkirinên Tirkiyê ji biryarên NY yên têkildarî ambargoya çekan li ser Lîbyayê, eşkere kirin. Komîteyê tekezî li nerewabûna leşkerî ya Tirkiyê li Îraq, Lîbya û Sûriyeyê kir û xwest ku artêşa Tirkiyê ji wan deveran, bê şert û merc, vekişe. Komîteyê her cure binpêkirina demografîk li herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de, weke herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dewama binpêkirina serweriya hin welatan, şermezar kir. Komîteyê daxwaz ji Tirkiyê kir ku rêzê ji mafê avê yên Îraq û Sûriyê re bigire û avakirina bendavan li ser çemên Firat û Dîcle rawestîne.

Tişta balkêş ew e ku itîraza aliyên nava civînê de, yên weke Qatar û Somalê, li ser daxuyaniya Komîteya Wezîran, weke berê nîn bû. Tişta ku li kêfa Tirkiyê nehatiye ew e ku; destwerdanên wê weke gefa li ser ewlekariya neteweyî ya Ereban hate dîtin. Ji lewre; jê hate xwestin ku di zûtirîn dem de, hêzên xwe û çeteyên xwe ji van welatan derxîne û li welatên Ereb, piştgiriya rêxistin û komên radîkal neke.

Bi encamnameya civîna 5'emîn a Komîteya Wezîran a têkildarî şopandina destwerdanên Tirkiyê, di nava karûbarên navxweyî yên welatên Ereb de, diyar bû ku hîna gomanên kûr li ser reftarên Tirkiyê hene. Çendîn hewl da be nêzîkatiyên xwe bi welatên Ereb re sererast bike jî, lê dewama destwerdanên wê yên leşkerî li herdu bakurên Sûriyê û Îraqê, mudexeleya kirîza Yemenê, liv û tevgera wê ya li rojhilatî Behra Spî, transforma çekan ji Lîbyayê re, li rex hemû metirsiyên li jor hatine rêzkirin, bêbaweriya herêmî û navdewletî bi reftarên Tirkiyê re kûrtir dike.

Di bingeha daxuyaniya Tirkiyê de, pêhesîneke bi îzolasyona xwe ya herêmî û navdewletî heye. Lewra, di dawiya daxuyaniya xwe de zimanê xwe nerm dike û ji welatên Komkara Erebî re dibêje ku ew amade ye bi hemûyan re bixebite!

Dewleta Tirk piştî ku di êrişên xwe yên ser Başûrê Kurdistanê de bi bin ket û nemerdiya pêkanîna êrişên nû li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, îzoleya ku jiyan dike, hewl dide belansa têkîliyên herêmî û navdewletî ava bike û terazûya ku deh salin bi kirîza li herêmê re ji dest daye, zindî bike. Lê çawa di rêbazên xwe yên şer û qetilaman de nekariye bi ser keve, wê nikaribe bi van siyasetên maskweşyayî re jî bi ser keve. Ji ber wê heqîqeta çors a Tirkiyê ku bi berxwedana Çiyayên Azad re rût maye, dostên wê yên fena Qatar û Somalê ku pişta xwe pê germ dikir, encamnameya civîna Komîteya Wezîran erê kirin.